

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî



Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI HUNERA FEWZÎ BÎLGE DE MOTÎFÊN FOLKLORÎK

Yılmaz ACAR

18721008

Şêwirmend

Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI HUNERA FEWZÎ BÎLGE DE MOTÎFÊN FOLKLORÎK

Yılmaz ACAR

18721008

Şêwirmend

Dr. Tareq Mohammed AWRAHIM

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Dİ HUNERA FEWZÎ BÎLGE DE MOTÎFÊN FOLKLORÎK” adlı projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

26/01/2020

YILMAZ ACAR

NAVEROK

KURTE	2
DESTPÊK	5
BEŞ I: AVAKIRINA TÊKÎLIYA GIŞTÎ	12
1.1.Pêvajoya Dîrokî Ya Xebatên Folklorê Kurdî	13
1.2.Folklor û Wêne	16
1.3.Folklorîzasyon û Folklor	19
1.4.Folklorîzasyon û Di Hunerê De Temsîla Wê	20
BEŞ II: FOLKLORA KURDAN	21
2.1.Folklorê Kurdan û Wêne	21
2.1.1.Di Folklorê Kurdan de Wêneyên Fewzî Bîlge	22
2.2. Di Wêneyên Fewzî Bîlge de Mijarên Sereke	22
2.2.1. Wêneyê Fewzî Bîlge de Temsîlên Folklorîk	22

DI HUNERA FEWZÎ BÎLGE DE MOTÎFÊN FOLKLORÎK

YILMAZ ACAR

KURTE

Fewzî Bîlge hunermendekî ku nêzî sî salane wêneyan çê dike. Yek jê hunermendê ku di wêneyê xwe de motîfen folklorîk diafirîne. Mijarên sereke yên wêneyên wî : cil û bergên kurdan ,mîmarîyên kurdan, dansên kurdan in. Em ê di vê xebatê de tespît bikin ku bikaranîna motîfên folklorîk yên Fewzî Bîlge temsîlên folklorîk kurdî ne yan na. Wêneyên wî yên hatine hilbijartin li gor kurdîyê wan hatine hilbijartin. Lêgerîna kurdîyê wan jî dabeşî çendin binbeşan bûne û xebat li gor van binbeşan hatîye amadekirin. Em ê di vê xebatê xwe de taybet li ser terîmên folklorîzasyonê û post-koloniyalîzme bisekinin û binirxînin ka wêneyên wî li ser van nerînan ave bûne yan na . Ji bo vê xebatê wekî rêbaz jî em ê Teorîya Erdnîgarîya û Dîrokîya Fînî bikar bînin. Ev xebat, ji ber ku li ser vê mijarê xebat nebûne girîng e.

Bêjeyên Sereke: Wêne, huner, kurdîyê, folklor, Fewzî Bîlge, Kurd, Teorî, Xebat.

ÖZET

Yaklaşık otuz yıldır resim yapan bir sanatçı olan Fewzi Bilge, resminde folklorik motifler kullanan sanatçılardan biri, eserlerinin ana konuları Kürt kıyafetleri, Kürt mimarisi, Kürt dansıdır. Bu çalışmada Fewzi Bilge motiflerinin kullanımının Kürt folklorunun temsili olup olmadığını sorgulayacağız. Seçilen resimler etnik kökenlerine göre seçildi, etnik kökenleri çeşitli kategorilere ayrıldı ve çalışmalar bu kategorilere göre hazırlandı. Bu çalışmada özellikle folklorizasyon ve sömürgecilik sonrası terimlerine odaklanacak ve gerçek olup olmadığını değerlendireceğiz. Fikirleri olsun ya da olmasın. Coğrafya ve Finlandiya Tarihi Teorisini bu çalışma için bir rehber olarak kullanacağız. Bu çalışma önemlidir çünkü bu konuda bir çalışma yoktur.

Anahtar Kelimeler: Resim, Sanat, Kürtçe, Folklor, Edebiyat, Kürtçe, Teori, Konu.

ABSTRACT

Fawzi Bilge is an artist who has been painting for nearly thirty years. One of the artists who creates folkloric motifs in his painting. The main subjects of his works are Kurdish costumes, Kurdish architecture, Kurdish dance. We will identify in this work that the use of Folzi Bilgi motifs are representative of Kurdish folklore. His selected images were selected according to their ethnicity. Their ethnicity has been divided into several categories and the work has been prepared according to these categories. In this work we will focus specifically on the terms folklorization and post-colonialism and evaluate whether they are genuine. whether or not he had any ideas .We will use Geography and Finnish Historical Theory as a guide for this work. This work is important because there is no work on this subject.

Key words: Painting, art, Kurdish, folklore, Folk art, Kurdish, Theory, Work.

PÊŞGOTIN

Di pêvajoya min ya di aliyê pêşveçûyîna Zimên de ji Mamoste Ayhan Meterowar re,
her wiha di aliye teknîkî de jî mamosteyê xwe mamoste ye xwe yê hêja Mamoste Mustafa
Arslan re sipasdarim. Nemaze ji van mamosteyan ,sipas ji bo mamosteyên me yê din yê
Enstîtûyê ji bo keda wan.

Yılmaz ACAR

MARDİN-2020

DESTPÊK

Ev xebat li ser motîfen folklorîk yên wêneyên Fewzî Bîlge wekî mejûya Folklorê ya di hûnera Kurdî de ye. Xebat li ser folklorê Kurdan bo mînak cil û bergên kurdan, motîfên efsanewî yên kurdan, mîmarîyên kurdan di wêneyên Fewzî Bîlge sekinîye. Em dê li ser hunera wî ya ku di nava kurdan de cîhek din digire û li ser taybetmendiyên hunera wî ya ku bi boyaxa zeytî afirandîye bisekinin. Di vê lêkolînê de bi giştî em dê li ser wêneyên Fewzî Bîlge li gor Teoriya Dîrokî-Erdnîgarîyê bi fikra folklorîzasyonê bi alîkarîya termên hunerî bisekinin û em ê di nav folklorê kurdan de cîhê wê dîyar bikin.

Ev mijar ji ber ku beriya wê ji aliyê tu kesî ve bi Kurdî nehatiye şirovekirin ango ji aliyê tu kesî ve nehatiye lêkolînkirin giring e. Ev mijar li gorî rê û rêbazên teoriyên folklorê û her wiha bi têkiliya hunera Fewzî Bîlge û post-koloniyalîzmê û bi nerînekî bi alîkarîya termên folklorê hatiye sekinandin. Astengiya vê mijarê ew e ku di vê qadê de lêkolîn tune ne. Ji ber vê yekê ji rê û rêbaz bi lêgerîna me ve girêdayîye.

Motif çî ye: Tiştên ku bi gelemperî tesîra wan li ser xebatan hene ne. Di hunerê bedew de (yên wek wêneyê ,plastîkî) motîf bi gelemperî dubarekirina xwezayê û bi berdewamîya wê, ji teşeyekî, ji komekî ye. Mirov dikare motîfê bi wî hawî bide nasîn.

Folklor çî ye; "ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelerî li gorî rêbazên xwe yên taybet lédikole, berhev dike , disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne." (YILDIRIM, PERTEV, & ASLAN, 2013, r. 11).

Cureyên folklorê mirov dikare wisa bibêje ; jiyana gund û bajaran , mîmarî, aboriya gel, cil û berg, bijîşkiya çandî û salnameya gelêrî; baweriyên gel; zayîn, mirin, zewac; cejn, pêşwazîkirin û oxirkirin; bizavên qalib yên gel; wêjeya gel; muzîka gel û alavên muzîkê ; lîstika zarokan û navlêk hinek .

Folklor ji du peyvên zimanê skandinavi yên "folk=gel" û "lore=zanîn" pêk tê û wateya wê ya ferhengî jî "zanîna gel" e. (KESKIN, 2019, r.23)

Celadet Elî Bedirxan di Hawarê de wisa dinivîsîne;

Folklor zanîna zanistîya xelkeki ye. Ev beje bi eslê xwe îngîlîzî ye. Lê îro ketiye hemû zimanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zimanê xwe. Ji xwe kurdên Qefqasê beriya me ev beje xistine zimanê xwe û kitebek bi navê Folklorî Kurdmancî belav kirine. (Bedirxan, 1941:15, r. 759)

Motîfên folklorîk çî ne; Motîfên folklorîk mirov dikare bibêje ku ;tiştên di berhemana de yê derbarê gel in û ji aliyê gellek kesan ve hatîne dubarekirin.

Xebatên Fewzî Bilge ye ku li Derika Mêrdin jidayîkbûye bi qasî sîh salane berdawam dikin. Fewzî Bîlge her çiqas li ser wênesazîya wî zedetir mirov dikare bisekine jî ew kesê ku dîroka kurdan ji xwe re kirîye karek û wek dirokzanekî ji mirov dikare wî şîrove bike lewma di wêneyên xwe de gellek caran motîfên efsanewî yê Kurdan bi kar anîye. Di xebatên Fewzî Bîlge de mîten wekî Zembîlfiroş kesên wekî Feqîyê Teyran cîh digirin. Heciyê Cindî bi navê "Epikên Kurdi" û ya Ordixanê Celil-Celilê Celil bi navê "Zargotina Kurda" temamiya efsaneya Zembîlfiroş pêşkêş kirine (GERNAS, 1995, r. 93). Di zembîlfiroşê de her wiha behsa şarên kurdan teyî kirin.

Di Binefşa Narîn ya ji beşek Zembîlfiroşê behsa Qerecdaxê dike û wisa dibêje : "Diranê wê sipîne ji birincê Qerecdaxê ye." (CELÎL & CELÎL, 2013, r. 169). Her wiha behsa Wêranşarê ya ku navçeya Rihayê ye dike û dibêje: "Xwe berdane çûne be'riya weranşarê." (CELÎL & CELÎL, 2013, r. 168).

Dîroka folklorî Kurdî de Mela Mahmûdê Bazidî wek pêşeng tê qebûl kirin. (YILDIRIM, PERTEV, & ASLAN, 2013, r. 53).

Carinan di wêneyan de kesên ku di nav cil û bergên Kurdan de govendê radîkin cîh digirin car carinan kesên ku li ser şarên kurdan li erbanê dixin (Erbane jî wek ku teyî zanîna enstrumanek Kurdan ya gelerî ye). Van motîfan bi tevahî mirov dikare wekî motîfên folklorîk bipejirîne. Di wêneyên xwe de her wiha motîfek olî wekî Melekê Tawîs jî bi kar tîne. Hilmi Turkoglu di pirtuka xwe de derheqê Melekê Tawîs de wisa dibêje: "Sembola herî pîroz ya Ezîdîyan ye kû Şex Adî ye wek xwedayê xwe hesab dikin çêkirîye çar heb peykerên Melekê tawîs in." (TURKOGLU, 2016, r. 126).

Wekî tê zanîn Ezdayetî olê kurdan ye kevnar e. Em ê bi van agahîyan li ser Kurdbûyîna wan ,motîfên ku Fewzî Bîlge bi kar tîne gelo motîfen gelerî ne ango tesîra wekî din li ser heye em e bînin ziman.

Huner binyada xwe ji lêkolînên ,nerînen curbicur digire. Yek jê ji van nerînan ji aliye zanistî Folklor e. Folklor alîkarîya hunerê plastikî her tim ber bi çavên civakê geş dimîne. Di îkonolojîyê de temsîla tiştan û bi kar anîna wan lêkolîn dibe. Di hunera bi motîfên folklorîk jî heman lêkolîn mirov dikare bike; ji ber ku di lêkolînên îkonolojîk li ser wateya tiştan disekine. Derheqê danasîna îkonolojîyê de Hunerzanistê navdar yê Elmanî Panofsky wisa dibêje; "Îkonolojî digel teşeyên berhemên hunerî, bi naverok û wateya wan re tekildar beşek zaniste ye." (PANOFSKY, 2014, s. 25).

Em ê lêkolîna xwe li gor teorîya folklorê ya bi navê Teorîya Dîrokî-Erdnîgarî binirxînin. Li gor Teorîya Dîrokî-Erdnîgarîyê; "Folklorîstên berawirdî, xwedêgiravî bikaranîna metoda Fînî ya dîrokî-erdnîgarî hewl didin ku dîroka çîrokeke kompleks ,car carinan stranek gelêrî an jî hêmanên din ên folklorê ji nû ve ava bikin. Ev metod bi reya hûrnêrîneke nepêşbiryar û bêqisûr ya her çîrokekê ji bo pêşîgirtina gelemperîkirineke bêihtiyad di derbarê binyad û wateya çîrokan de hatîye darijandin (dîzaynkirin). Ev teknîka lêkolînê ji 'teorî'yê, bêhtir wek 'metod' tê binavkirin. Têvî vê yekê ,metod pala xwe dide ser hinek pêşbîneyên teorîk, û dibe sedemên hinek gengeşîyên gewre yê teorîk." (DORSON, 2017, r. 35).

Li ser vê yeke mirov dema binirxîne li ser binyada berheman li gor vê teorîyê ,mîrov dibêje gelo formen ku tînen pêşbazkirin yê kîjan demî ne û ji kîjan deme maye em ê dê bi kurahî li ser vê agahîyê bisekinin.

Folklorîzasyon çî ye?. Li gor Decoo yê Emrîkî folklorîzasyon: "Folklorîzasyon taybetmendîyek kolonyalîzmê ye. Folklorîzasyon rakêşîya zêde jê ji nostaljîyê distîne xwe. Pêşî derketîna folklorîzasyonê li ser teşebusa çekirîna pîran e, bi hêsanî li ser bîyanîkirinê ye. Ji cudahîyan zêdetir li ser wekhevîyan disekine" (DECOO, 2005, r. 23(2)).

"Gondolvanê Venedîkî cilên Îtalî yê xweyî li xwe nakin" (DECOO, 2005, r. 24(4)).

Li ser vê tiştê mirov dikare bêje folklorîzasyon li ser mirovan wekhevîyê çêdike. Mirov dema li Wêneyên Fewzî Bilge dinere ji wekhevîyên gelan zêdetir cudahîyên kurdan yên ji gelên din derdikeve pêşberî me .Bo mînak Qonaxa Îshaq Paşa ya ku li Bazîdê ye di wêneyê wî de cîh digire.”Qonaxa Îshaq Paşa ji aliyê Begê Kurd di dema Osmanîyan de jîyaye hatîye çêkirin.Qonax di sala 1685an destpêkirîye û di sala 1784an de hatîye temamkirin.Di vê Qonaxê de kesen wek Ahmedê Xanê wekî Nivîsvanê Dîwanê xebitîye û niha jî gora wî li vê Qonaxê de ye.Di nav gel de wekî ‘Kelha Behlûl Paşa’ tê zanîn.” (Şaredariya Bazîdê, 2019) .Li ser van cudahîyan lêkolina me watedar e.

Di malpera mûzeyê di sala 1897 li Londona Ingîlîstanê hatiye avakirin Mûzeyê TATE MODERNê hunera postkolonyal wisa tê nasîn :

“Teoriya postkolonyalîzmê ew e ku bingeha hunera postkolonyale ,tekiliya wê bi hesanî bi piştî dema dewletên ku hatibûn dagirkirin ku azadiya xwe dewletên dagirker bi dest xistin tune ye.Ev analiz û bersivên ji bo kolonyalîzma bêmayiyên çandî û mirovan ji bo encama kontrola welatekî ,meqseda mêtina welatiyan û welatê wan.Bi kirina vê ev rê dide ku çawa civak û çanda mirovên ne Ewropîne di perspektîfa zanîna çanda rojavayî xuya dibû;çawa wan mirovan xistibûna bin kontrola xwe wekî koloniyên Dewletên Ewropî yên Mader ;û nasnameyên kolonîzer û kolonîzekirî.

Întellektûelê Martîniqê’î Frantz Fanon kesekî di warê fikra antî-kolonyalîzmê de di sedsala 20an de girînge,û peydakirina çarçoveya teorîyê ji bo nirxandina zextên kesane di bin Împeryalîzmê de ji elementek girîng zêdetirîn ji bo hunera postkolonyal e.Tesîra girîng ya li ser fikrê Fanon de fikrên mamoste û aqilmendê wî Aimé Césaire yek jê serokê bizava Negritude ye .

Pirtukên wî wekî ‘Wretched of the Earth (Herimandina Dinyayê)’ yekem car di sala 1961an de çap bûye ,Fanon analîza tesîra kolonyalîzmê û dekolonyalîzmê û rola çînê ,dozê,çanda gelêrî û dijwariya têkoşîna ji bo rizgariya gel dike. (Werger:Yılmaz ACAR)” (TATE MODERN,2020).

Di sedsala 20an de dewletên ku di sedsala 19an de bingeha dewletên yek alî yek reng û yek navî peyde kiribûn di hunera wan de jî hunerek bi vî aveyî peyde bû.Piştî kolonîzekirina

van welatan huner di nava gengeşiyêke de mabû û dixwest xwe ji nava vê gengeşiyê derbixe. Her wiha ji ber rewşa polîtîk nîkarîbû teşeyekî kevnare bigire aliyê xwe û kir ku şeklek nû derxe holê . Ji serdestiya welatên Ewrûpî li welatên bindest hunerek nu ave bû. Hunerek derbarê fikrek azad û welatek serbixwe û ramanên azad hunerek nû peyde bû.

Du Mînakên ji hunera postkolonyal ji aliyê Afrikayê û Emrikayê ji bo miroven reşîk û Gelê Çermesor wisa ne;



Wêne 1



Wêne 2

Xebatên hunermendên postkolonyal pêşplana teşeyen nirxandina bertekî û ramiyarê elementekî pratîkên azadker ,yek jê dikare nerînek li hunera xwe wekî alî bike.Wekî kû Walter Benjamin gotibû ‘‘Melankolî’’. (Dimitriadis&Mccarthy, 2000,r.235)

Ji wêneyan tê dîtin ku kolonyalîzm tesîr li hunera gelên dagirkirî piştî ku gelên dagirker heza xwe ya li ser van gelan dikişinin hunera gel jî şeklek nû digire ser xwe û hunerek nû derkikeve holê .

Terzek hunera postkolonyal hebe pejirandine ,ango berovajî we ,ji niv re pejirandine.Wekî berxwedana weneyek nû çêkiri ya kolonyal.Hunera postkolonyal zêdetirî cûreyekî şewazek e.Û ew şewaz hêsanî poşmanî û tawanbarî dianî mijarên giran yê kevin. (<https://www.artandaustralia.com/online/discursions/decolonising-%E2%80%98postcolonial%E2%80%99>, 2017)(werger:Yilmaz Acar)

Folklor û post-kolonyalîzm peywendiyê mezî bi hev re digirin ,lewma gelên bindest piştî azadiya xwe bi dest xistin ,hunera wan,jiyana wan,fîkrê wan,ramanên wan û gelek caran hewldanên wan jî pir şewazek cuda girt.Êdî gelen berê bindest bi fîkrê bindest hunera xwe digel fikra berê hunerek nu ave kirin.

Ji bo famkirina Folklorê jî hin tişt pewist in.Teorî û rêbazên folklorê bi piranî di bin du sernavan kom dibin.Beşek ji van naveroka metnên edebiyata gelêrî bingeh dibînin,beşek jî kontekst(Pêwend) û performansê(şiyar)bingeh dibînin.((YILDIRIM, PERTEV, & ASLAN, 2013,r.42)

Teorîyên folklorê deh in mirov dikare van wisa binbeş bike;

1)Teoriya Deynwerigirtina Çandî û Koçkirina Çîrokan;

2)Teoriya Peresanî an Ekola Antropolojîyê

3)Teoriyên Folklorê yên Metin Navendî

4)Teoriya Geşedanê

5)Teoriya Belavbûnê

6)Teoriya Dîrokî û Erdnîgariya Fînî

7)Teoriya Psikoanalîtîk

8)Teoriya Li Ser Rêbazên Binyadgeriyê

9)Teoriyên Folklorê yên Pêwend

10)Teoriya Li Ser Rêbazên Karbend

Ger em li ser Teoriya Dîrokî û Erdnîgariya Fînî bisekinin ;

Ev rêbaz armanc dike ku teşeya pêşî ya vegotinên gelêrî û nemaze yên çîroka diyar bike. Yanî gelo vegotîneke gelêrî an çîrokek, cara pêşîn li ku û kengî hatiye afirandin.

Li gor vê rêbazê mirov dikare bibêje ku wêneyên Fewzî Bîlge Folklorîk in. Lewma Fewzî Bîlge wêneyên xwe li gor çavkaniyên îroyîn hunera Kurdan temsîl dike .

Li gor çavkaniyekî îroyîn derbarê efsaneya Şahmeran wisa dibêje;

Cîhê ku wekî Rojhilata Nêzîk ango wek Asyaya Pêşîn tê bi nav kirin ,gellek jê ji mîtosan yên qîmetê hevpar yên gelên li wê heremê ne. Her wiha Mêrdin jî ji ber ku ji aliyê erdnîgarîyê cihekî dijwar deye ,dibe hevparê ango afirînerê hilberê kollektîf. (ALP, 2015,r.50)

BEŞ I: AVAKIRINA TEKÎLIYA GIŞTÎ

1.1. Pêvajoya Dîrokî Ya Xebatên Folklorê Kurdî

Pêvajoya dîrokî ya xebatên folklorê Kurdî bi serdema Dewleta Osmanî dest pê dibe.

Wek ku Necat Keskîn di pirtûka xwe de (KESKIN, 2019) diyar kiriye rêza dîroka folklorê wisa ye ;

A) Serdema Dewleta Osmanî

1) Destpêk: Mela Mahmûdê Bazidî

2) Serdema Weşanên Kurdî

3) Kovara Jîn û Komeleya Kurd ji bo Zanîna û Weşanan (KKZW-KTMNC)

B) Serdema Piştî Dewleta Osmanî

1) Xebatên Kurdên Sovyetê: Xebatên Îlmî yên Folklorê

2) Hawar, Ronahî, Roja Nû-Sûrî/Beyrûd

3) Herema Kurdistanê/Başûr

4) Bakurê Kurdistan (Tirkiyê)

5) Rojhilatê Kurdistan (Îran)

Pirsgirêka ku me di destpêkê de behsa wê kiribû Necat Keskîn jî di pirtûka xwe ya bi navê Folklor û Edebîyata Gelêrî de dibêje ;

Nivîsandina folklorê Kurdî hinekî bi pirsgirêk e, kurd heta van salên dawîn nebûne xwedî statûyeke fermî; "yekbûnî" yeke kurdan di serdema netew-dewletan de ava nebûye. Ji ber vê yekê jî pirsên wek gelî dê li gorî çi dîrokê bê nivîsandin, li ser kîjan bingehan û çawa dê bê dabêşkirin, divê mirov jî ku dest bi vê dîrokê bike? li benda bersivan dimînin. (KESKIN, 2019, r, 80)

A)Serdema Dewleta Osmanî

1)Destpêk:Mela Mahmûdê Bazidî

Di vê serdemê de xebatên herî pêşîn yê Mela Mahmûdê Bazidî ye.Mela Mahmûdê Bazidî wek pêşengê Folklorê Kurdî tê zanîn.Mela Mahmûdê Bazidî ,bi konsolosê Rusyayê yê Erziromê rojhilatnas Alexander JABA re gellek xebatên pîralî û hêja kiriye.Bazidî,gellek kilam ,Bêrite,Gotinên Pêşîyan berhev kir.Mela Mahmûdê Bazidî,berhema hêja û giranbuha ya Ehmedê Xanê Mem û Zînê ,ya Selîmê Sileman Yusif û Zelîxaye ,ya Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûnê,ya Feqîyê Teyran Şexê Sen'an,Bersisê Abid û Qewlê Hespê Reş wêkî çîrokî nivîsandiye.

2)Serdema Weşanên Kurdî

Di vê serdemê de hişyariya netewetîye derket holê .Xwenaskirina Kurdan jî di vê serdemê de derdikeve holê .Serhildanên mîrektîyan,damezrandina eyaleta Kurdistanê û piştî serhildana Şêx Ubeydullah Nehrî ‘ ‘xwenaskirina kurdan bi pêş ve dibe. (KESKIN, 2019,r.85)

Rewşenbîrên Kurd bi vî fikrî ketin nav hewldanan ,saziyan avakirin,kovaran derxistin ,rojnameyan çap kirin.Rojnameya herî pêşîn di vî warî de Rojnameya Kurdistanê (1898-1902)ye.Rojname cara yekem di sala 1898an de hatiye çapkirin.Metnên Mem û Zîn a Ehmedê Xanê cara yekem di vê rojnameyê de tê çapkirin.Her wiha Cemiyeta Alîkarî û Pêşveçûnê ya Kurd û rojnameya cemiyetê Rojnameya Alîkarî û Pêşveçûnê ya Kurd ;Rojnameya Şark û Kurdistan (1908);Rojnameya Kurdistan(wekî Kurdistana duyem jî tê binavkirin) (1908);Peyman(1909);Amidî Sevda(1909);Yekbûn(1913) hatine weşandin.Kovarên bi navê Rojî Kurd(1913),Hetawî Kurd(1913),Yekbûn(1913) hatine çapkirin.

3)Kovara Jîn û Komeleya Kurd ji bo Zanîne û Weşanan(KKZW-KTMNC)

Kare bê gotin ku Komeleya Pêşketina Kurdistanê û kovara komaleyê ya ne fermî Jîn(1918-19),bûn pêşengê neteweperweriya Kurdan ya wê demê.Kovara Jînê behtir wek berdevkê vê hişmendiya netewî derdikeve pêş. (KESKIN, 2019,r.92).Yekem car di kovarê de Destana

Memê Alan ya Evdirehim Rehmî Hekkarî ya kurt ku ji du perdeyan pêk te tê weşandin.û her wiha efsaneyê Kawayê Hesinkar di vê kovarê de derbas dibe.

B)Serdema Piştî Dewleta Osmanî

1)Xebatên Kurdên Sovyetê:Xebatên Îlmî yên Folklorê

Xebatên Peter Lerch,Alexander Jaba,I.A.Orbeli,N.M.Yar,Basil Nikitin,Minorksy xebatên sereke ne.Di vê qadê de xebatên yen giring her wekî din yên Ordixanê Celîl birayê wî Celîlê Celîl bi navê Zargotina Kurda lêkolînek kirine û bi vê lêkolînê jî berhevkarîya edebiyata gelêrî kirine.Ordixanê Celîl teza xwe ya doktorayê li ser destana Kela Dimdimê nivîsandîye.

Hecîyê Cindî ji bi navê Hikayetên Cimaeta Kurdî çîrokên Kurdî berhev kiriye.

2)Hawar,Ronahî,Roja Nû-Sûrî/Beyrûd

Kovara Hawarê ;

Berhevkirina çîrok,çîrçîrok,û her şîkl lawje û stranên Kurdî.Zanînên derbarê reqs û qeydiyên stranên kurdî.Dîrok û erdnîgariya Kurdistanê .Zanînê her şîkl û rezikên kurdî û Kurdistanê ,yên zamane borî û senifandina wan. (KESKIN, 2019,r.104)

57 hejmarên kovarê tê weşandin.

Kovara Ronahiye;

Wekî pêveka wêneyî ya kovara Hawarê dertê .Bi tevahî 28 hejmar dertê.Di kovarê de gellek berhemên edebiyata gelêrî cîh digirin.Tevgerê ji bo folklorê Kurdî heye.

Rojnameya Roja Nû;

Di rojnameyê de nivîskarên Hawar û Ronahiyê nivîsandîne.Celadet Elî Bedirxan stranên gelêrî wergerandiye Fransî û her wiha Roger Lescot jî çîrok û stranên Kurdî wergerandiye ji bo Fransî.

3)Herema Kurdistanê/Başûr

Di vê qadê de kesên herî serkeftî Pîremêrd e.Xebatên Pîremêrd yên tekildarê folklorê ev in;

Kîtêbî Pendî Pêşîyan-1936

Çîroka Mahmûdê Axayê Şêwekal-1942

Galte û Gep-1947

Yen wekî din xebatan kirine wisa ne;

Izeddîn Resûl -Edebî Folklorî Kurdî(1970)

Serdar Fetah Emîn-Xarmaniyek Li Metelê Folklorî Kurdî(1970)

Şukriya Ibrahîm Resul-Edebî Folklorî Kurdî

Mihemed R.Remezani -Mindal û Çîrokên Mindalan(Çîrok û Çîrokên Zarokan)(1984)

4)Bakurê Kurdistan(Tirkiyê)

Li Bakurê Kurdistanê saziyên wekî NÇM(Navenda Çanda Mezopotamya),Enstituya Kurdî ya Stenbolê hatine damezirandin.Her wiha weşanxaneyên bi navê Avesta ,Nûbihar,Lîs,Dara,- û Vate(ya zaravayê Kirmanckî) têna avekirin.Kovarên bi navê W,Zend,war,Vate(bi Kirmanckî),Nûbihar kovarên çapkirin.Her wiha kovarek bi navê Folklor Me ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin Amed der tê lêbelê piştî ku qeyûm tê tayinkirin kovarê edî nayê çapkirin lewma pişt re dîsa dest bi weşana xwe dike û di kovarê de minakên curbicur yê Folklorê Kurdî der tê çapkirin.Her wiha ji aliyê mamosteyên Enstîtuya Zimanên Zindî Remezani Pertev û Mustafa Arslan jî pirtukek bi navê Ji Destpêke heta niha Folklorê Kurdî

Hatiye çapkirin.


5)Rojhilatê Kurdistan(Îran)

Xebatên pêşîn yê Rojhilat ji aliyê kesek biyanî bi navê Oscar MANN tê kirin.Oscar MANN ji sala 1901ê heta sala 1903yan,17 beyt û çîrokên ji herema Mukriyan berhev kirine û di sala 1905an de di pirtûkekê bi navê Tuhfey Muzeferiyê çap kiriye.Qadir Fetahê Qazî ji sala 1966an heta 2005an gellek beyt û menzûmeyên gotinên pêşîyan en herema Mukriyan berhev kirine û çap kirine (KESKIN, 2019,r.118)

1.2.Folklor û Wêne

Hunera gelêrî bi hemû formên xwe yî dîtbar ji textên folklorê tèn ave kirin. Berhemên gelêrî,şêwaz û motif tesîra xwe li ser gellek hunermendan kirine.Yek jê ji van hunermendan wênesaz Pablo Picasso ye.Picasso ilhama xwe ji peyker û maskên êlên Afrîkî girtiye. Di sedsala nozdemîn de hunermendên rojavayî ,berê xwe dane estetîka ku bi gotinên plastîkî bi gotin dibûn yên li welatên Islamî gellek dihatin dîtin.Pablo Picasso,Paul Klee û Wassily Kandinsky ji hunera Magribê ,Henri Matisse,Hans Hartung û Van Doesberg ji minyatûrên Îslamê û ji hezkirina berhevkirina hunera Xetê di vê serdemê de dest pê dîke(dawiya sedsala 19mîn û sedsala 20mîn). (KAROĞLU, 2014,r.101)

Hin wêneyên Pablo Picasso;



Wêne 3



Wêne 4

Wekî ku tê dîtin pîcasso hin maskên Afrîkayî çêkiriye dîroka van maskan diçe heta dema Paleolîtîk .Ev mask di jiyana Afrîkayê de temsîla hin jê hêmanên gelêrî dike.

Wekî mînak ;

Rûmetdarkirina Qralan

Amedehiya Şer

Înfaza Cezayê


Dêlindêza Zayînê

Birîna Cezayê

Cenaze

Pîcasso ji van hêmanên folklorê sûd wergirtiye û xebatên curbicur çêkiriye.

Wenesazek din yê bi navê Paul Gauguin yê ji Fransayê ku ji bo di nava çandên nu de bimîne û ji wan çandan sûd wergire çûbû Tahîtî ya Emrîkaya Navîn û bi salan li wir mabû hin ji çand û folklorê Tahîtîyê minakan çêkiribû. Wekî mînak mirov dikare Illustrasyonên Folklorê Tahîtîyê yên ku ew çêkiribû dikare bide. Gauguin di pirtuka xwe ya bi navê Ancien Culte (Perizîna Kevnar) de behsa adetên kevnar yên Tahîtîyê dike.



Wêne 5

Wêne ji ber ku wekî dîrokî ji nivîsê kevnartirê, ji bo folklorê gelan rêça herî kûr e. Her wiha gelen di dîroka kevnar de bi alîkariya wêneyan folklorê xwe kolane diwarên şikeftan.

Li Îndonezyayê li girava Borneoyê li ser dîwarên şikeftan wêneyên ajalên yê di jîyana wan de cîh digirin çêkirine.



Wêne 6

Li kevirê li Avustralyayê Ubirrê yê Parka Netewî ya Kakaduyê wêneyên hinin ajalan yên ku nava wan rê dide hatine çêkirin.



Wêne 7

1.3.Folklorîzasyon Û Folklor

Berhem û vegotinên pêvajoya gelêrî mixabin dibin cureyên bikaranînê ya ku di fesalên netewî de tîbî bikaranîn.Gellek caran bergeh û livên gellek kesên ku çanda gelêrî egzotîk-hilbijartî û pêvgûhertî ku wekî xuyaye zaf cuda ne,ji bilî wateya wê ya rasyonel,û zedetirî tevan aliyê afirînerê kêşê hîsî-Întellektuelî yê balkêşiyê dikişîne.Formek din yê xerakirina berheman yê çandî ‘‘Folklorîzasyon’’ e-ev ji niv ve stîlîzekirin ya vegotinên çandî, ku ew wan dike estetîka hindiktir, tevlihev û watedar (SEITEL, 2001,r.6).

"Folklorîzasyon" pêvajoyek e ku bi hêla "folklor" ve ji nû ve an ji hêla komek taybetî ya folklorî ve tê nû kirin.Peyva "folklorîzekirin" pêvajoyek e ku kevneşopiyek kevnar ji nû ve tê zindî kirin û bi zexmî di şewaza xwe ya guherandî de ji nû ve tê damezrandin (Hogarth, 2001,r.238).

1.4.Folklorîzasyon Û Di Hunerê De Temsîla Wê

Çîrçîrokên yê Xoceyê Nesredîn yê li Bosnîa û Herzegovînayê tîbî gotin, hevterîbîyê bi yê Anatoliyayê dikişînin.Ev jî sedema ku demekî Bosnia û Herzegovîna di bin desthilatdariya Osmanîyan de bû hevterîbîyê bi hev re dikişînin.Li vê serdemê peşîn çanda vegotinê de ,hêmanên çapkirî û yê nivîskî de nezîkahî di nav du cografyayan çêbibû.Carinan navên li çîrçîrokan guherî carinan jî çîrçîrokên wekhev derketibûn holê.Ev rewş gellek asayî ye.Di folklorê de ji vê re Folklorîzasyon tê gotin. (BAYRAKTAR, 2018)

Wekî li welatên din ên komunîst, muzîka kevneşopî ya mongolî 'folklorîze' bû. Ev nav danasîna form û teoriyên ji muzîka rojavayî û tevîhevkirina wan bi muzîka çandî ya mongolî re dihewand. Muzîkologê rûsî Boris Feodorovich Smirnov bi organîzekirina yekem orkestrayên folklorî li Mongolya pêşengiya vê praktîkê kir. Van civakan hem sazûmanên neteweyî yên Ewrûpî hem jî Mongol jî pêk anîn. Smirnov her weha standardkirina pergala tunekirinê ya muzîka Mongolî standard kir; Berê 12 pergalên tunekirina kevneşopî hebûn, lê Smirnov ew bi tenê du heban bi sînor kir. Muzîkvan neçar bûn ku nîşana Ewropî fêr bibin. Di vê navberê de, amûr dema dihatin lêxistin hatin 'nûjenkirin' û cîhê wan hatin guhernadin. (<https://tur.worldtourismgroup.com/music-mongolia-communism-14510>, 2020)

Mirov dikare bibêje folklorîzasyon kirina hemanan ango berhemana tevî folklorek din bi haweyêkî 'şêrînkirî'.

BEŞ II: FOLKLORA KURDAN

2.1.Folklorî Kurdan û Wêne

Di folklorî kurdan de wêne ,cîhekî girîng digire her wiha li diwarên malan li ser xalîçeyan wêneyên xwezayê û li diwaran fotoyên wêneyên hunermendan wekî Ehmedê Xanî û wêneyên Şahmeran cîh digirin.

2.1.1.Di Folklorî Kurdan de Wêneyên Fewzî Bîlge

Wêneyên Fewzî Bîlge di nav kurdan de cîhek bêhempa digire lewma wêneyên wî behsa dîrok û xwezaya Kurdistanê dike. Wêne ji bo dîrokê girîng wekî ku me behsa wê di rûpelên paş de kiribû erdnîgarî ji ber tundîtiya dewletan diguhere .Lêbelê hunermend wek hişê dîrokê qeyda dîmenên xwezayê digirin û ji rojên pêş ev jî dibe perçeyek zanînê. Wêneyên derbarê dîrok û çanda gelan di dîroka gelan de cîhê cuda digirin lewma wêne ji fotokêşanê ji aliyekî bi cudatîya xwe bal dikişînin ew jî ev e ku wêne ew curehunere ku mirov dikarin hêstê xwe zêdetir lê bar bikin. Wekî mînak berhema Pablo Picasso ya Guernicayê behsa şerê navendî yê Îspanyayê dike;



Wêne 8

Her wiha wêneyê Eugene Delacroix yê Fransî behsa Şoreşa Fransîyan dike;



Wêne 9

Wêneyên Fewzî Bîlge jî di vi warî de cîhek digire ew jî dixwaze wekî Delacroix û Picasso cîhekî di diroka xwe de çêbike.

2.2. Di Wêneyên Fewzî Bîlge de Mijarên Sereke

Di wêneyan de mijaren sereke Navdarên kurd ye edebiyatnûs :Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanê ,Şahmeran ,Mîmariyên Kurdan, Cil û bergên kurdan,Zembîlfiroş in.

2.2.1. Wêneye Fewzî Bîlge de Temsîlen Folklorîk

Di wêneyên Fewzî Bîlge de temsîlên folklorik wisa ne ;



Wêne 10



Wêne 11

Wekî ku teyî zanîn Şahmeran yek jê ji efsaneyên Kurdan e.



Wêne 12

Weneyekî Zembîlfiroş Nav û nîşan û jiyana Zembîlfiroş pêwîste em bidin lewma di nivîsê de behsa cîhe ku lê jiyaye nîşan dide:

Navê wî yê dirust Mîr S'îdê Kurê Mîr Hesenê Paşayê Diyarbekir e(1) û wekî di serhatiye wî de xuya dibe, Mîr S'îd lawekî zor şox û şeng û ciwan bû û her kesekî çavê wî pê ketiba dilê wî dibijiyayê û evî mîrî gelek hez ji rav û nêçîrê dikir û jiyana xwe bi xweşî û keyf diborand. Belê rojekê li demê vegeyriyane wî ji ravê li devera Zaxoyê û li nêzîk goristanekê dît hindek mirov miriyekî bigor dikin û danîne li ser darebestekê. Îna pirsiyar kir ka eve kî ye, dît xortekî çarde salî ye û got erê ez jî dê bimirim? Zembîlfiroş kurê mîr e

Çûbû ser gorekî kûr e

Bîra mirinê hate bîre...

Çû malê bi dilekî nexweş û vê rûdanê kartêkirineka li derûnê Mîr S'îdî kir û berev jiyaneke derwêşiyê û koçekiyê bir û xwe kire feqîrekî xerqepoş û dest ji xweşiya dinê berda û berev jiyaneke derwêşiyê çû û jiyana xoşkandinê bo xwe kire serbor û berev du'a û diroze û 'îbadetê çû, weku di vê sebaqa qewlê axiretê de xuya dibe(2):

Feqîra êk çêkir

Çû ji xoşî û lefzetê dinê kir

Ev dunya hêla û bereb axretê kir

Her dîsan di beyta Zembîlfiroş da xuya dibe, demê dibêje(3):Go derkeve tu neyê pêş....here li dinê bibe derwêş

Nehêle qet rojî û nivêj.....bibe feqîrek xerqepoş

Lewma Mîr S'îd jiyana xwe guhart û xerqê feqîra kire ber xwe û jiyana mîrîtiyê ji xwe dûr kir û bajarê Dîyarbekir bi cî hişt û berev bajarê Mêrdînê çû li maleka veder jiyana xwe û xêzana xwe bi rê ve bir û di wî kulkî da qemîş dîna û selk û zembîl çêdikirin û li bazarê difrotin û bi behayê wan nan bo xêzana xwe dikirî. Dibêje:

Li riya Xwedê dê bim 'evdal

Selka dê gêrim mal bi mal

Da bixo bikem rizqek helal

Pê bijînim jin û mindal

Rojekê li demê geran da selka li nav mala çavê mîrekekê bi Zembîlfiroş ket û dilê wê ne dilekî ketê belku bi hezar dila keftê û deng li xudama xwe kir da wî Zembîlfiroşî bînine cem wê û demê gehîştine qesra wê dergeh lê girt. Belê Zembîlfiroş mirovekî Xwedênas û derwêş bû û xwe dûrî xatunê kir û naçar bû xwe di ser banê qesrê re avêt. Belê çu lê nehat. Xatunê neşîya Zembîlfiroşî ji bîr bike û xulam û xudam berdane nav bajarî heta bi ser mala wî hîlbûn.Îna xatunê qesta mala wî kir û hevîna wî qaîl kir ku cilkên xwe pêk bigihurin da digel Zembîlfiroşî bijît. Belê nikarî armanca xwe bi cih bîne.Evên li xwarê çend beyt in wek hevpeyvîn di nava Zembîlfiroş û xatunê de:

Xatûn dibê hey lawikê ciwan

Dilê min qet naçit selkan

Min ji te divêt keyf û seyran

Zembîlfiroş got:Hey xatunê xoş hermetê

Agirê Xwedê bi canê te ketê

Ma ne qiyamet ya li dû me di tê

Ez lew nakem vê suhbetê

Piştî Zembîlfiroş ev dîmene dîtî careka din ew bajêr bi cî hişt û vegeriya Dîyarbekir û piştî çend sala babê wî mir û ew bû Mîrê Dîyarbekir û li ser textê paşayê rûnişt. Belê bi roj hikimdarî digêra û bi şev selk çêdikirin û bi huhayê wan nan bo zarokên xwe dikirî bi keda xwe ya helal.Li dumahiyê mebest ji vê çîrokî û serhatiyê ew e ku mirov 'edaletê bi kar bîne û zulmê neket û hizra jiyana xwe bike li dunya û axretê û aqlê xwe li ser nefsa xwe zal bike.

Eve hûn ew deqê nebelavkirî ji beyta Zembîlfiroşî ku serhatiya wî hate gêran û li ser zarê husta Cemo Mecêwrê Xetarê (Xaterê gund e) hatiye veguhastin û wî ji hustayê xwe wergirtiye.

Ji Malabadê ya li navçeya Ferqînê ya Amedê dîmenek;



Wêne 13

Navdarê Kurd Ehmedê Xanê (1605 Çelê-Colemêrg-1707 Bazid-Agirî) navdarê kurd ,

Ehmedê Xanî di sala 1650 an jî 51'ê de li bajarê Colemêrgê li gundê Xanê hatiye dinyayê. Di sala 1707an de li Bazîdê wefat kiriye. Navê bavê wî Şêx Îlyas e, navê kalikê wî Eyaz e. Xanî ji eşîra "Xaniyan" e û tê gotin ku bi xwe qet nezewiciye.

Perwerdehiya wî;

Jiyana Xanî di nav perwerdehiyê de derbas bûye. Xanî perwerdehiya xwe ya pêşîn Quran û fiqihê li cem bavê xwe Şêx Îlyas digire, piştî xwendina li cem bavê diçe di medreseyên Bidlîs û Xelatê de dixwîne, xwendina xwe li Bexda, Şam, Heleb û di medreseyên Îranê de jî pêş ve dixe. Di medreseyên Îranê de hînê felsefeya îslamê, astronomî û filolojiyê dibe. Di medreseyên Sûriyê de jî hînê felsefeya yewnanê dibe. Xanî piştî demekî diçe bajarê Mekeyê heca xwe dike, ji wê şûn de diçe Misirê jî digere û dizivire Bazîdê.

Xanî bi xwe di bin bandora filozofên weke Aristoteles, Farabî, Şihabedînê Suhrewerdî, Muhyedîn ibn Erebî, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û gelek filozofên din de dimîne û bi fikr û ramanên xwe ve rê li pêşîya filozofên dû xwe vekiriye.

Ehmedê Xanî di dîroka kurd û Kurdistanê de bi nav û deng e. Derbarê pêşveçûna çand, huner, wêje û zimanê kurdî de cihê wî cuda û pir girîng e.

Xanî di 14 saliya xwe de dest bi nivîsandinê dike, piraniya pirtûkên xwe bi kurdî bi zaravayê kurmancî nivîsandine. Xanî bi taybetî, ji bo ku zarokên kurda baş dîn û zimanê xwe hîn bibin pirtûkeke bi navê Nûbihara biçûkan dinivîse û nivê pirtûkê jî dike ferhenga kurdî-erebî û ev ferhenga wî di dîroka kurdan de bûye ferhenga herî pêşîn û bi sed salan ve di Medreseyan Kurdistanê de tê xwendin.

Xanî tevê kurdî, çar ziman (tirkî, erebî û farsî) dizanîbû.

Ehmedê Xanî ji bona perwerdehiya zarokên kurdan medrese jî vekiriye û li wir ders daye telebeyan. Di medresa Ehmedê Xanî de dersên olî fiqih û hedîs û dersên zanistê yê weke felsefe, dîrok, wêje, erdnîgarî, astronomî û hwd. dihatin dayîn.

Helbestvanê bi nav û deng Îsmâîlê Bazîdî û gelek wêjevanên kurd di bin bandora Xanî de mane.

Ehmedê Xanî di sala 1707'an de li Bazîdê diçe ber rehma Xwedê û tîrbeya wî li Bazîdê ye. (https://ku.wikipedia.org/wiki/Ehmed%C3%AA_Xan%C3%AE, 2020)

û Malabadê ;



Wêne 14

Feqiyê Teyran yek jê helbestvanê Kurd e, Jînenîgariya wî wisa ye;

Feqiyê Teyran, li gor hin dîrokan, di 1590'an de hatiye dinê û di 1632-1660'an de çûya ser dilovaniya xwe. Li ser van dîrokan riwayetên muxtelif hene. Ya rastî ew e ku Feqiyê Teyran di 1590'an de hatiye dinê û jiyanê mezîn û bi zanist berdewam kiriye.

Di gelek vegotin û nivîsan de behsa wê yekê tê kirin ku Feqiyê Teyran helbestvan bû. Ya rastî ew e ku ew ne tenê şair bû, lê di ber re filozofekî mezîn jî bû. Di dema xwe de li ser hizir pir kûr bûye û pir nivîsandîye. Herçend zêde pirtûkên wî heta îro nehatibin jî, em dizanin ku wî ne yek an jî du, lê hinek pirtûk nivîsandîne. Li ser felsefe, dîrokê, dema xwe de û pêşketinên dema xwe, hizre xwe aniye ser ziman.

Feqiyê Teyran li gundê Miksê ji dayîk bûye, ko girêdayiyê Colemêrg(Hekarî) ye. Lê Mikis an jî Miks, niha girêdayiyê Wanê ye. Navê Feqiyê Teyran yê rastî jî, weka di çarînê de gotiye "Mihemed" (Mîr Mihemed) e. Feqî di helbestek xwe de jî navlêka xwe "Mîr Mihê" daniye.

Ew bi xwe ji malbatek eşîrîye. Bavkalê wî ji Dewleta Osmaniyan fermana mîrî yê girtine. Di dîroka wêjeya kurdî de cihekî bêhempa digire. Helbestvan, destannivîs û çîrok nivîsekî mezin e. Kurê mirekî kurd e. Berhemên nivîskar wek Şêxê Senan, Qiseya Bersiyayî û Qewla Hespê Reş e. Her wiha, di nav nivîskarên kurd de cara ewil pexşan nivîsiye (Ber Sîsê Abid).

Feqiyê Teyran perwerdeya medreseyê girtiye. Kesekî xwenda û zana ye. Di dema wi de axa Kurdistan û rojhilatê medreseyan olî hebû ne. Di van medreseyan de agahiyên olî, dersên ziman û wêjeyê hatine dayin. Bi navê “Feqî” peyva ilm û şagirtiyê ya “teyrê” ji berhema bi navê mentiq et-teyrê têt in. Ev berhema ku pir tê zanin a Feridedîn Etar e. Wateya wê, axafitina çûka ye. Feqî hem ji aliyê şewaza helbestnivîs e, hem jî ji aliyê ramanî ve tesîr ji Feridedîn Atarî girtiye. Mewlana jî tesîr ji ferasate tesewufî ya Feridedîn Atarî girtiye. Feqî di wêjeya kurdî de helbestvanekî girîng yê ku li ser xweza, evîn û tesewûfî nivîsiye. Di nava gel de baş tê nasîn. Navê wî yê ku herî zêde tê zanîn Feqiyê Teyran e. Lê em dizanin ku di berhemên xwe de bi navên wek Feqê Tera, Feqiyê Gerok, Miskî, Xoce, Mîr Mihê, Mim û hê jî bi kar aniye. Li gorî lêkolînan, dibe ku Feqî ji malbateke mîran be û navê wî yê bi rastî Mihemed e. Tirbeya wî li navçeya Miksê ya Wanê ye.

(https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran, 2020)



ÇAVKANÎ

- (2020, 01 25). <https://tur.worldtourismgroup.com/music-mongolia-communism-14510>:
<https://tur.worldtourismgroup.com/music-mongolia-communism-14510> adresinden alındı
- ALP, M. (2015). *Efsanelerden Masallara MARDİN*. Mardin: M.S.T. PROJESİ.
- BAYRAKTAR, Y. D. (2018, 4 24). <https://www.bosnakmedya.com/bosna-hersek-sozlu-kulturunde-nasredin-hoca-etkisi-ve-bosnakca-fikralar/> adresinden alındı
- Bedirxan, C. E. (1941). *Folkloru Kurdmancî*. Şam.
- CELİL, O., & CELİL, C. (2013). *Zargotina Kurda*. Amed: Aram .
- DECOO, W. (2005). *Folklorization*.
<https://www.timesandseasons.org/harchive/2005/04/folklorization/> adresinden alındı
- Dimitriadis, C. M. (2000). *institutionalizing of third world aesthetics*. Jerusalem: Ariel.
- DORSON, M. (2017). *Folklor û Teorîyên Folklorê Yêî İroyîn*. Stenbol: Avesta.
- GERNAS, a. (1995). *Zembîlfiroş*. Stockholm: Roja Nu.
- Hogarth, H.-k. K. (2001, 01 25). The Gangneung Dano Festival:The Folklorization of Korean Shamanistic Heritage. *Vol.41.*, 238~253.
https://www.ekoreajournal.net/issue/view_pop.htm?Idx=3161 adresinden alındı
- https://ku.wikipedia.org/wiki/Ehmed%C3%AA_Xan%C3%AE. (2020, 01 25).
https://ku.wikipedia.org/wiki/Ehmed%C3%AA_Xan%C3%AE:
https://ku.wikipedia.org/wiki/Ehmed%C3%AA_Xan%C3%AE adresinden alındı
- https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran. (2020, 01 25).
https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran:
https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran adresinden alındı
- <https://www.artandaustralia.com/online/discussions/decolonising-%E2%80%98postcolonial%E2%80%99>. (2017). artandaustralia. adresinden alındı
- KAROĞLU, P. D. (2014). FOLKLORİK UNSURLARIN RESME YANSIMASI VE YAŞATILMASI BAĞLAMINDA BAZI DÜŞÜNCELER. *MİLLÎ FOLKLOR*, 101.
- KESKIN, N. (2019). *FOLKLOR Ü EDEBİYATA GELİRİ*. STENBOL: AVESTA.
- PANOFSKY, E. (2014). *İkonolojî Araştırmaları*. İstanbul: Pınhan.
- SEITEL, P. (2001). Proposed Terminology for Intangible Cultural Heritage:. *United Nations Educational, Scientific and Cultural Organization* (s. 1-15). Piedmont, Italy,: United Nations Educational, Scientific and Cultural Organization.
- Şaredarîya Bazîdê*. (2019, 5 11).
<http://www.dogubayazit.bel.tr/index.php?page=dbazit&op=openPage&id=9&title=ishak-Pasa-Sarayi-Kela-Behl%FBI-Pasa> adresinden alındı

TATE MODERN. (tarih yok). [tate.org.uk: https://www.tate.org.uk/art/art-terms/p/postcolonial-art](https://www.tate.org.uk/art/art-terms/p/postcolonial-art)
adresinden alındı

TURKOGLU, H. (2016). *Yezîdîlik*. Stenbol: Festîval.

YILDIRIM, K., PERTEV, R., & ASLAN, M. (2013). *Jî Destpêke heta Niha FOLKLORA KURDÎ. STENBOL:
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ.*



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Projesi

DI HUNERA FEWZÎ BÎLGE DE MOTÎFÊN FOLKLORÎK

YILMAZ ACAR

18721008

Danışman

TAREQ MOHAMMED AWRAHIM

Mardin-2020